


Ew malên me wêran dikin, em jî dengên xwe didin wan

»»» R:7



Ebdulwehab Ehmed: “Ew rêveberiya xweser, ti taybetmendiya wê ya kurdî tineye”.

»»» R:4




Xwîna hevpar!

»»» R:2



Xermanana bixwîn

»»» R:5



Bi lêdanê jî Kurd nebûn Tirk

»»» R:8



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (357) 06-09-2019 Buha (1000) Tûmen*

## Dorpêçên aborî dê berdewam bin

**Berdevkeke Koşka Spî li rêkevta 14`ê Xermananê di “twitt”ekê de ragihandibû: Serkomarê Amerîkayê “Donald Trump” di pêwendiyeke telefonî de, digel “Emmanuel Macron” serkomarê Firansayê dabû zanîn ku dorpêçên ser Îranê wekî xwe dimînin û nahêne rakirin. “Cad Dîr” di wê “twitt”ekê de îşare bi vê yekê kiriye ku, Trump û Macron li ser wê xalê yekdengin ku hewce ye pêşî li hewil û çalakiyên têkderane ên Îranê bigrin ku, bi hemû awayekî hewl dide ku, azadiya bazirganî nemaze di Kendavê de bixe metirsiyê. Navbirî dupat kiriye ku Trump gotiye: Di niha de, bi tu awayekî dorpêçên aborî nayne rakirin.**



Ev nûçeye di demekê de belav bûye ku, serkomarê rejîma Îranê Hesen Rûhanî roja Çarşemî bas li “Pêngava Sêhem” li derheq kêmkirina sozên Bercamê ji aliyê rejîma Îranê ve kiriye. Hevdem Cewad Zerîf di nameyekê de bo “Federica Mogherini” Berpirsa Siyaseta derve a Yekîtiya Ewropayê basa wê dijîkiryar a nû ya Taranê kiribû.

Ew mijare jî dijîkiriyareke tund a Yekîtiya Ewropayê û parek li berpirsên Ewropayî li pey xwe hebûye. “Gîniz Fûndêrmûl” Berdevkê Wezareta Derve a Fransayê ragehand: Îran dibe li her pêngavekê ku berevajiyê sozên nav Bercamê ye biparêz e. Herwisa Wezareta Derve ya Birîraniyayê eşkire kiriye ku, gellaleya Îranê bo (helpisardina) “Hilawîstina” Bercamê ye û xalên wî cihê nigeraniyê ye û qazancê lê nake. Komara Îslamî heya niha di sê qonax de xalên nav Bercamê binpê kiriye û eve jî nigeraniya cîhanê li pey xwe hebûye.

## Sergotar

### Xwîna hevpar!

N: Kerîm Perwîzî

Xwîna hevpar!

Xwînên wek hev, yan jî xwînên ku cureyên wan nêzîkî hev in, weke pênase û pîvana nêzîkatiya mirovan têne binavkirin. Ji bo mînak dema ku di çanda Kurdan de behsa mirovekî dikin ku pêwendiya malbatê bi wî re heye, tê gotin ku ji xwîna me ye yan jî em hevxwîn in. Hevxwînbûn û ji xwîna malbatê, amajeya nêzîkatî û pêwendiyeke civakî a herî nêzîk e.

Behsa hevxwînbûn û ji xwîna hev, gihaye mijara pênaseya nijad û netewe. Lêkolîn û şopandinên pir berfireh hatine kirin ku nîşan didin çawan xwîna wek hev û nêzîkî hev, bandorê dike ser cendek, rû û riftara mirovan. Herwisa amajeyê dike ser cudahiya di navbera nijadên cuda de. Wekheviyên di wê girûpa nijadî de jî destnîşan dike.

Teoriya taybet bi netewe û pênaseya netewî jî di heman pêxemê de derketiye holê. Bi vî rengî, faktereke netewebûna girûpeke mirovan, girêdayî warê jênêtîk û xwîna wekhev û nêzîkî hev e.

Teoriyeke din a netewebûnê, xebat û vîna xelkê weke bingeh dibîne û dibêje ew gelê ku vîneke hevpar hebe û di pêxema vê vîna hevpar de xebatê bike, di rêbazeke dîrokî de ewê pênaseya neteweyê li xwe bigirin.

Di derbarê Kurdan de jî dema ku mirov li dîroka wan dinêre û fakterên cuda ên wan dinirxîne, mirov digihe ser vê encamê ku ew ji hemû neteweyên din cuda ne û parek ji ti neteweyeke din nîn in. Kurd bixwe neteweyeke cuda ye û taybetmendiyên wî ên netewî hene.

Fakterek girîng jî ku netewebûna Kurdan diselmîne, mijara xwîn e.

Eger em zêde derbasî mijara nijad jî nebin ku bi paramêtrên jênêtîkî di wir de jî Kurdan xwîna taybet a xwe heye, lê belê ji wê jî girîngtir faktera xwîn e ku weke xebat û vîna netewî tê binavkirin.

Kurdan ne tenê di pêxema vîna netewî de xebateke demdirêj û watedar domandine, lê belê gelek caran jî xwna wan li ser axa Kurdistanê tevlî hev bûye. Ew jî bi komkujî û qirkirina wan ji aliyê dagirkaran ve û bi fîşek û mûşekên heman hêzan bûye. Ti cudahiyeke nav û nasname û tak û girûpên wan qurbaniyan li cem dagirkar nîn e û tenê bi sedema Kurdbûnê, xwîna wan hatiye rijandin.

Bi biryara cîhadê a Xumeynî li dijî Kurdan, kuştina xelkê li gund û bajaran, bombebarana bajarên Kurdistanê, jehrîkirina kadr û pêşmergeyên Kurdistanê û jin û zarokên wan, darvekirina bi komî a xortên Kurd û êrîşa bi mûşekan a li dijî xebatkarên Kurd, xwîna wan weke neteweyek li hev civiya ye û tevlî hev bûye. Xwîna wan ji aliyê dujminekî hevpar ve li ser axa Kurdistanê hatiye rijandin.

Heman xwîna hevpar, bihevrebûna netewî çê dike.

### Dezgeha Hilbijartinê ya PDKÎ û Dezgeha Hilbijartin a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê civîyan




**Şandeke Dezgeha Hilbijartinê a PDKÎ, serdana Dezgeha Hilbijartin a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê kir, û di vê dîdarê de, bas li alugorên piştî kongereya Partiya Demokrat kirin.**

Roja Yekşemî 10`ê Xermanana 1398 (2`ê Îlona 2019`an), şandeke Dezgeha Hilbijartin a Partiya Demokarat, bi serperstiya "Selîm Zencîrî" berpirsê vê Dezgehê, tevî "Îsma`îl rehmanî" berpirsê Pêwendiyên Hizbê li bajarê Silêmaniyê, serdana Dezgeha Hilbijartin a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, li bajarê Silêmaniyê kirin.

Şanda PDKÎ ji aliyê hey`eta Dezgeha Hilbijartin a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê ve bi serperestiya "Rizgar Elî" pêşvazî ji van hate kirin.

Di vê dîdarê de, şanda PDKÎ tevî pîrozbahî li erkê nû û hêviya serkevtin bo rêzdariyan xwast, bas li alugorîn piştî kongereya 16 û guherîna pêkhate û avabûna Dezgeheke taybet bi pirsa hilbijartin di Hizba Demokrat de kir.

Girîngî dan bi pirsa hilbijartin ku bandoreke rastewxwe li ser qedera netewan û kûrahîkirina riha Demokrasî û aştî û aramî heye, bas û mijarên vê civînê bûn.

Di vê dîdarê de, herdu alî li derheq pirsa hilbijartin, basa vê yekê kirin ku, emê Kurd jî, dibe di wê devera pir li alozî û arîşe de, di ceribandina wê ezmûnê û pêşxistinê de berdewam û xwedê rol bin.
Di dawiyê de, tevî kêfxweşiya herdu Şand li vê dîdarê, û tekez li ser xurtkirina pêwendiyên herdu Dezgeh û hevkariya wan di vê pêwendiyê de kirin.

## Navenda Havkarî: Desthilata siyasî di Îranê de roj li pey rojê zêdetir di kîna hemû xelkê Îranê de dixendiqe

**Rejîma Îslamî a Îranê li warê sîyasî û li warê rewabûna dîplomasî û navnetewеyî roj li pey roj ber bi kiz û lawaziyê diçe.**

Roja Şemî rêketa 9`ê Xermanana 1398`an (31`ê Tebaxa 2019`an), bi mêvandariya Komela Şoreşger a Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê û bi serperestiya Sereterê giştî ê Komeleya Şoreşger, "Ebdulah Muhtedî", civîna Navenda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê hate lidarxistin.

Ew civîne bi amadebûna "Mistefa Hicrî" Lêprsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, "Umer Îlxanîzade" Sekreterê Komeleya Zehmetkêşan, "Miestefa Mewlûdî" Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistan û "Ebdulah Muhtedî" Sekreterê Giştî a Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê, hate lidarxistin.

Di vê civînê de çendîn bas û mijarên girîng ên siyasî ên pêwendîdar bi deverê bigiştî û bi taybet Îran, gotûbêj li ser hate kirin û tevî alugorê bîr û raman, amadebûyan nerênên xwe bi agehdariya yektir gihandin. Aliyên amade di Navenda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê tev hevbir bûn ku desthelata siyesî li Îranê bi afirandina qeyranê, roj li pey roj di nav kîn û bêzariya hemû xelkê Îranê de dixeniq e , û hemû xelk nerazîbûn û bêzarî li wê rejîmê, bi xebata komel û medenî lê hatine pêş û hemû eva ne wê rastiyê derdixin ku komara Îslamî li warê siyasî û di warê rewabûna dîplomasî û navneteweyî de, roj bi roj ber bi kizî û lawaziyê diç e.

Parek din a vê civînê çavlêkirinek bû bi ser kar û erkên Naveda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê, ku tevî nirxandina kar û çalakiyên vê Navendê û nerênên li ser xebata giştî û herwisa yekgirtiya xebata siyasî û giştî li navxwe û derveyê Kurdistanê, bi hewce zanin. Di devra paşerojê de, ev Navende asta çalakiyên xwe bo bersivdan bi pirsên giştî û herwisa hevahengiyeke zêdetir li navbera Hizib û xebatkarên navxwe û tevgerên



cemawerî, berfireh bike û di asta navxwe û navdewletî de nûneratiya wan tevgeran bik e.

Bersivdan bi wan egerên ku pê diçe li meşa ber bi pêşvçûna bûyerên Îran û deverê, Partiyên Rojhilatê Kurdistanê, rûbirû bibin, û mijarek din a civîna Sekreterên Giştî ên Partiyên Kurdistana Îranê bû. Di vê mijarê de, hemûyan nerînên xwe di vê derheqê de xistine ber bas ku çawa bikarin li egera hatina qerebalixeke nû, meşa xebatê ber bi pêş bibin û li berjwendiya tevgera rewa ya gelê Kurd li derfetan mifaheke hewce verbigrin. Bi vê meramê li ser hevdengî, yekgirtina herçend zêdetir a Partiyên beşdar li tevgera Kurd û Kurdistana Îranê misoger kiriye.

Di dawiya vê dîdarê de, çend gotar bo kar û çalakî û çawahiya rûbirû bûn digel pirsên siyasî dan, daku di paşerojê de biçine warê cîbicî kirinê. Civîn piştî çend demjimêran gotûbêj û alugora bîr û ramanan li keş û hevayeke dustane û hevdengî dawî pê hat, û ji aliyê hey`eta mêvandarî ve hatine bi rê kirin.

Navenda Havkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê

9`ê Xermanana 1398`an

31`ê Tebaxa 2019`an

## Rêûresma bidawîhatina dewreke din a siyasî bo pêşmergeyan bi rê ve çû



**Rêûresma dawîhatina dewreyek din a siyasî bo pêşmergan, bi amadebûna parek li endamên rêberî, kadir, pêşmerge û malbatên Hizba Demokrat, hate lidarxistin.**

Roja Çarşemî, rêketa 11`ê Xermanan, rêûresma dawîhatina dewreyek din a siyasî bo pêşmergên PDKÎ, ji aliyê Dezgeha Perwerede û Lêkolînve di binkeyeke Hizba Demokrat de bi rê ve çû.

Rêûresim bi xwandina marşa netewî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîsteké bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir.

Piştre peyama Dezgeha Perwerde û Lêkolîneve ji aliyê "Leyla Dilpesend" ve hate pêşkêşkirin.
Piştre peyama dewre ji naliyê "Aro Semedî" ve hate xwindin.


Di parek din a vê rêûresmê de, stranek ji aliyê "Nîzam Secadî" ve bo amadebûnên dewrê hate pêşkêşkirin.

Di dawiya rêûresmê de, mamoste "Qasim Keleşî", endamê Navenda Siyasî a Partiya Demokrat, xelata kesên ku serkevtin di vê dewrê de bidestanîne pêşkêş kir.

# Gotûbêj digel "Ebdulwehab Ehmed", Endamê Hevrêziya giştî ya Tevgera Çaksazî a kurdî li sûriyê, û berpirsê giştî ê rêxistina tevgerê li Herêma Kurdistanê derbarê avakirina Herêma Aram



Ebdulwehab Ehmed: "Ew rêveberiya xweser, ti taybetmendiya wê ya kurdî tineye".




**H: Kêyhan Mihemedînijad**

P- Devera ewle ku li ser sînorê Tirkiyê û Rojavayê Kurdistanê çawa dibe, û kê rol tê de heye?

B: Li gorî rêkeftina di navbera Emrîka û Turkiyê de, û li gora zanyariyên ku di ragehandinên giştî de belav dibin, ta niha ev rêkeftin ê were cîbicîkirin li ser sê qonaxan.

Qonaxa yekem ê ji rojavayê Serêkaniyê ta Girêspî dest pê bik bi kûrahiya 5km, û herwiha bi vekişandina çekên giran û hêzên PYD-ê ve ta kûrahiya 20km ji wê deverê. Qonaxa duyem ê ji Serêkaniyê ta Qamişlo dest pê bike. Qonaxa sêyem ê ji Qamişlo ta sînorê Herêma Kurdistanê dest pê bike.

Her wiha ev herêma wê di bin çavdêriya odeya operasyonê de be, ya hevbeş di navbera Emrîkan û Turkiya de. Karûbarê vê odeyê aktîvkirina xalên rêkeftinê ye.

P- Çêkirina devera ewle çi bandorekê wê li ser wan navçan de hebe, ku niha di dest hêzên Kurd de ne?

B: Pabendbûna bi aktîvkirina xalên vê rêkeftinê ji aliyê hemû aliyên têkildar. Her wiha wê şer(ceng) dûrî vê herêmê bibe. Û wê rê li hember destwerdana Turkiyê û kaselîsên çekdar ên Sûriye yên ser bi Turkiyê ve wê bigre.
Herwiha wê dabînkirin aramiyê ji Kurdan û ji hemû pêkhatiyên herêmê re peyda bibe. Û wê rê bide ji damezirandina rêveberiyek sivîl a nû re, ku hemû pêkhatiyên herêmê û partiyên siyasî hevkar bin tê de.

Her wiha wê rê li hember gefên Turkiyê bên girtin bi hêceta êrîşkirinên PKKê û şaxê wê yî li Sûriyê PYDê.

P- Devera ewle berjewendiya kê diparêze, û mebesta bingehîn a çêkirina wê çiye?

B: Heke herêma aram di bin çavdêriya navdewletî û welatên derdorê de be,wê ji berjewendiyên hemû pêkhatiyên herêmê re be, û ya sereke jî, di berjewendiyên gelê Kurd de be.

Lê belê ya ku ta niha cudabûn di navbera Emerîka û Turkiyê de heye, li ser vê xalê li hev nekirine. Ji ber ku Turkiya dixwaze roleke wê yî sereke di rêveberiya vê herêmê de hebe. Bi hêceta parastina ewlehiya netewî ya xwe. Û dûrxistina partiya PYDê ji sînorê xwe yê başûr. Lê metersiya Turkiya ji avakirina rêveberiyeke taybet a kurdî heye, ji ber vê yekê, bi her awayî dixwaze derbasî Herêmên Kurdan bibe.

P- Rewşa Kurdan li rojavayê Kurdistanê dê çawa be?

B: Mixabin ta niha partiya PYDê napejirîne (qebûl nake) bi ti hevpariyek rastî, bi partiyên Kurdî yên sereke di herêmê de, û di serî de ENKSê.

Her wiha PYDê bi tena xwe nikarîbû rêveberiya Herêmên Kurdî bikra. Ji ber ku ramyarî nehat pejirandin ji hêla welatên derdora herêmê û opozisyona Sûriyê ve.
Her wiha di heman demê de, ENKSê ji PYDê daxwaz kiriye ku ji rêkeftinên Hewlêr û Duhokê vegere ji bo rêveberiya Kurdistana Sûriye, ji aliye siyasî, lêşkerî û rêveberî bi hevpariyek rast li ser xaka Kurdistana Sûriye.
Herwiha çi pêngavên di derbarê herêma aram de, aniha tên diyarkirin, çareseriyek demikî ye, armanc jê ji bo nehêle Turkiye ewlehî û aramiya herêmên di bin deshelata Emerîka de lihevxe û metirsiyê çêke. Ji ber ku hin metersî ji rêxistina DAÎŞ û kaselîsên Îranê li Sûriye heye.

Her wiha çareseriya doza gelê Kurd li Sûriye, girêdayî ye bi çareseriya siyasî ya giştî bi kirîza Sûriye ve, li gorî rêbazgeha Cinêv û biryara encûmena ewlehî 2254.

Lê hebûna berdewamiya gefên Turkiyê li ser destwerdana wê li herêmên Kurdan, heke hebûna herêma aram di bin çavdêriya navdewletî de be, wê têkeve xizmeta gelê kurd û wê şer û wêrankirinê jî dûr bibe.


P- Stato û qewara îdara Kurdan dê bimîne, yan rêka parastina deskevtên Kurdan wê çi be?

B: Ew rêveberiya xweser ya bi ser partiya PYDê ve, rêveberiyeke Kurdî nîne, û ew ne Kurdî, Erebî û herêmî ye jî. Ji ber ku hatiye avakirin li ser bingeha dirûşma biratiya gelan, û netewa demokrat û ti taybetmendiya wê yî kurdî tineye. Bes ew bi ser îdeolojiya partiyekê tenê ve ye.

Her wiha Emerîka û welatên rojav bi giştî û hin welatên Erebî kar dikin li ser avakirina herêmekê ji bo ku rêveberiyek nû û fireh lê bê peydakirin. Da ku hemû pêkhatiyên herêmê hevpar bin (Kurd, Ereb, Aşûr, Siryan) û hêzên siyasî bi awayekî rastîn li ser kar bin di encûmenên xwecihî û asayîş û ewlehiya sînor de.

**Têbîn: Boçûnên birêz Ebdulwehab Ehmed, boçûnên wî ên şexsî ne û Agirî li hember de berpirsyar nine.**

# Xermanana bixwîn



**N: Bêhzad Qadirî**



Dîroka Kurd gellek evraz û nişîv bi xwe ve dîtine, û bi baldana bi rewşa niha ya Kurd û Kurdistanê, û herweha guherînkariyên herêmê evraz û nişîvên siberojê jî tê pêşbînîkirin, û tu rûpelek ji dîrok Kurd de tuneye ku bas ji hezkirina Kurd bo nîştiman neke. Meha Xermananê jî wekî Pûşperê meheke pirr ji xwîndan bûye, û di heyama yek sala borî de, ew meh ji bo Kurdan sortir ji berê bûye, helbet em nabe ku ji bîr bikin ku di vê mehê de û di hemêû rojekê de kesên nîştimanî û dehan pêşmergeyên qehreman canê xwe pêşkêşî nîştiman kirine, û di vê babetê de, emê awirekê bidin çend bûyer û karesatên mezin ên dîroka Kurdan, ku tu carî gelê Kurd ji bîr nake.

Ji roj 2-ê Xermanan sala 2680-î ya Kurdî (1980) ve em dest pê bikin ku termê Sergurd Ebasî û termê çend pêşmergeyên din di Mehabadê de hatin naştin. Di vê meraismê de hejmareke zêde ji xelkê Mehabadê amade bûn, û heyetek ji endamên PDKÎ di vê goristanê de bi vê boneyê ve gotar xwendin. Terorkirina endamên PDKÎ ji aliyê rejîma terorîstperwer ya Îslamiya Îranê ve, ji sala 1359-an de dest pê kiriye, û sergurd Ebasî yekemîn endamê rêberatiya PDKÎ bûye ku ji aliyê rejîma Îranê ve hatiye terorkirin.

Di roja 3-ê Xermananê de wate di sala 2718-an a Kurdî (2018) de, di karesateke dilêş û biguman de çar jîngehparêzên Merîwanî canê xwe ji dest dan, ku bi şehîdên kesk yan şehîdên jîngehê hatine naskirin. Şehîdan "Şerîf Bacwer û Omîd Konepoşî" û du hevalên wan ên din sala borî di dema vemirandina agirê daristanan ên gundê Pêle a Merîwanê di bûyereke biguman de rastî şewatê hatin, û canê xwe pêşkêşî jîngeha nîştimana xwe kirin. Kak Şerîf Bacwer û kak Omîd Konepoşî ji endamên çalak û naskirî û dilsojê Encumena Sewz ya Çiya a Merîwanê bûn ku bi salan bû ezmûna berberekaniya digel agir hebûn, û xelk li ser vê baweriyê ne ku rejîmê dest di şehîdkirina van jîngehparêzan de hebûye.

Di roja 5-ê Xermanan sala 1358-an a Rojî (1979-an) de û hevdem digel biryara cîhada Xomêynî ê cellad 11 Kurd di dadgehîkirineke 5 deqeyî de bi mirinê hatin mehkûmkirin û di firokexaneya bajarê Sine de hatin gullebarankirin, ku bi "îdamên li firokexane"yê hatiye binavkirin. du kes ji wan 11 kesan ku di firokexaneyê de hatin gullebarankirin, birîndar bûn û kesek bi birankardê birin ber darê îdamê, û belavbûna wêneyên îdamên li bajarê Sine di belavokên navxwe û derve de, her wê demê nerazîbûna mezin ya civatên xelkê lê ket.

Çend rojan piştî 5-ê Xermananê û di roja 9-ê Xermanana sala 1358-an a Rojî (1979) de, Foad Mustefa Sultanî naskirî bi kak Foad yek ji avakerên Komleyê bi destên hêzên rejîma Tehranê di şerekî neberamber de hate şehîdkirin. Rola Kak Foad di dîroka tevgera Rojhilata Kurdistanê de diyar e. Tenê heşt mehan piştî rizgariya ji bendîxaneyê û heya dema şehîdbûnê di temenê 31 saliyê de û di vê heyama kêm de karî rûpeleke nû binexşîne. Du roj bi ser şehîdkirina kak Foad re derbaz bibû ku di roja 11-ê Xermanana sala 1358-an a Rojî (1979) de ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve wate ji aliyê Spaha Pasdaran a terorîstî ve, komkujiya Qarnê rû da, di vê komkujiyê de 68 Kurdên xelkê gundê Qarnê a ser bi bajarê Nexedê li Rojhilata Kurdiostanê ku jin û zarok û pîr û îxtiyar bûn bi destên celladên rejîmê bêrehmane hatin kuştin û rûpeleke bixwîn di dîroka Kurd de hate hildan.

Herweha di roja 17-ê Xermanana 2718-an a Kurdî (2018) de, û dîsan Kurd kete ber êrîşa rejîma hov û mûşekên rejîmê çendîn şoreşgerên Kurd şehîd kirin. 17-ê Xermananê rojeke bixwîn bû ku hemû Kurdistan hejand.
Di vê roja bixwîn de sê lawên Kurd bi navên Ramîn Husên penahî û Zanyar Muradî, û Luqman Muradî ji aliyê rejîma komara sêdareyê ve hatin îdamkirin, û hevdem rejîmê binkeyên Hizba Demokrat li Koyê mûşekbaran kirin, û du mamosteyên fêrgeha PDKÎ bi navên Farûq Hesenxeyat û Muxtar Qadirpûr tevlî karwana şehîdên Kurdistanê bûn. Herweha di vê êrîşê de 14 kadr û pêşmergeyên "Hevalên Pêşîn" hatin şehîdkirin.

Di roja 26-ê Xermanana sala 1371-an a Rojî (1992) de karesata Mîkonosê rû da. Di vê karesatê de Dr. Sadiq Şerefkendî sekreterê giştî ê wê demê yê PDKÎ ji aliyê rejîma Îranê ve hate şehîdkirin. Dr. Şerefkendî piştî terorkirina Dr. Qasimlo bû sekreterê giştî ê PDKÎ. Di karesata Mîkonosê de her wekî Dr. Qasimlo bû qurbaniyê destê terorê. Dadgehekê li bajarê Birlînê de piştî lêkolîna bûyera Mîkonosê, şandiyên rejîma Îslamiya Îranê bo encamdana vê terorê tawanbar kirin. Elî Xamineyî rêberê rejîma Îslamiya Îranê û Ekber Haşimiyê Refsencanî serkomarê wê demê ê rejîmê û Elî Felahiyan Wezîrê Îtila`ata wê demê ya rejîmê wekî bikerên sereke ên vê terorê hatin nasîn.

Ew mînak tenê dilopek in ji deryaya cinayetên rejîma Îslamiya Îranê li dijî gelê Kurd.

# Mafê Mirovan li Rojhelata Kurdistanê



N: Azad Kurdî

Mafên mirovan bi giştî weke bingeha azadî, dad û aştiyê li cîhanê tê dîtin û berçavgirtin. Armanc jê dabînkirina jiyana ewle, serbest, dûr ji hemû çewisandin û zilmekê ye. Mafên mirovan pêk tê ji hemû mafên mirovî yên takekesî û giştî weke siyasî, huqûqî, aborî, civakî û kultûrî ku dewletên xwedî serwer divê wan biparêzin. Parastina mafê mirova weke yek ji pîvanên sereke yên demokratîkbûna dewletan tê dîtin.

Di peywendiyên navdewletî de jî parastina mafên mirovan ji aliyê dewletên endam di Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de weke xaleke girîng tê berçavgirtin. Di welatên daxistî û dîktatûr de ku rewşa mafê mirovan ne baş e, Neteweyên Yekgirtî û dewletên demokratîk yên endam tê de, wan welatn rexne dikin û gellek car xeztê jî dixin ser wan. Lê bi kiryar çi nekirine û çi jî li wan welatan nehatiye guhertin.

Di heyamê 40 salên borî yên desthilatdariya rejîma ïslamî ya Îranê de, dehan car rejîma Îranê bi biryarnameyên fermî weke welateke binpêker ê mafê mirovan hatiye nasandin û mehkûmkirin. Lê mixabin ev biryarname û gellek cezayên din nebûne sedem ku rewşa mafê mirovan li Îranê bi giştî û bi taybet li herêmên ku neteweyên ne fars tê de dijîn ber bi başiyê biçe. Ji ber ku di warê kiryar de ne parastina mafê mirovan xaleke girîng a dîplomasiyê nebûye, tenê ji kol xwe vekirin bûye. Biryarname û rexneyên Neteweyên Yekgirtî û gellek welatên endam tê de li ser rejîma Îranê û dewletên ên din ku mafê mairovan naparêzin, weke karreke rûyekî û bê kiryar bûye. Ji ber ku berjewendiyên aborî û ticarî yên xwe ligel welatên binpêkar ên mafê mirovan zêdetir girîng dibînin heta zextanîn bo ser wan welatan bona parastina mafên mirovan.

Ev yek bûye sedem ku her diçe rewşa mafê mirovan li Îranê û welatên din ên daxistî û dîktatûr de zêde û berfirehtir dibe. Ji ber bê helwêstî û ne micidbûna welatên demokratîk ligel Îranê, em dibînin rewşa mafê mirovan di kambaxtirîn qonaxan de derbas dibe. Bêy berçavgirtin raya giştî û civaka navdewletî hemû bingehên mafê mirovan ji serî heta binî binpê dike.



Ji xeynî Îranê bi giştî, rewş li Rojhelata Kurdistanê gellek cuda ye. Ji roja fermana Cîhad û qirkirina kurdan bi destê XOmêynî 40 salan berî niha, dagirkirin, kuştin, kavilkirin, birsîkirin û bêkarkirin, girtin, zîndanîkirin, îdam û îşkencekirin, fetisandin û bêdengkirin û dûrkirin ji bingehên nasnameya neteweyî û zext û zilm di hemû warên jiyanê de bûye siyaseta fermî ya dewleta Îranê li Rojhelata Kurdistanê. Rêjîma Îranê Kurdistan kiriye girtîgehek gellek daxistî di nav welateke daxistîtir de, bi awayekê ku hevwelatiyê/a kurd het anekare bi azadî bêhnê jî bikşîne. Li hemû xalên mafê mirovan berçavtir, kuştin û birîndarkirina bi bername û sîstematîk a kasibkarên kurd in li ser sînoran in. Ev yek bûye diyardeya herî berçav a binpêkirina mafê mirovan li Rojhelata Kurdistanê. Dibe hevwelatî çiqas nirx hebe lalî dewleteke û derce çend be ku ji ber birin û anîna hinek alevên jiyanê û dabînkirina hecdariyên jiyana malbatên xwe, rasterast bi guleyên hêzên rejîmê bêne kuştin û birîndarkirin, bêy ku çi qurbaniyekê mafê lêpirsîn û heta rexneyê jî hebe ! Êdî mirov dibe bixwîne ku kurdbûn di vê rêjîmê de tê çi wateyekê !

Rêjîm 1 ji sedî ya bingehên Daxuyaniya Mafê Mirovan ya Cîhanî jî li Kurdistanê berçav nagire. Lewma jiyan ji hemû xweşî û şirîniyê wê ji gel re kiriye talî û nexweşî. Ewna hemû ji yek pirsê çavkanî digirin, ew jî kurdbûn e. Ji roja ku rejîma Xomêynî hatiye ser kar, her ji destpêkê gelê kurd naverok û bingeha rêjîmê bi başî nas kir. Rêjîmê Kurdistan kiriye binkeyeke leşkerî û mîlitarîze kiriye, herêmek ku çi bêhnek jî li mafê mirovan lê nayê û civaka navdewletî jî lê bêdeng û bê helwêst e...

# Tekoşerên Demokrat yad û bîra şehîdên jîngehparêz bilind nirxandin

**Endam û alîgirên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê li bajarê Sine, yada Şehîdên jîngehparêz, bilind nirxandin.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye malpera "Kurdistanmedia"yê, endam û alîgirên Hizba Demokrat li bajarê Sine, roja Yekşemî, 3`ê Xermanan, li yekemîn salvegera Şehîdbûna Şehîdên jîngehê, Şehîdan "Şerîf Bacwer" û " Omîd Konepoşî" bi belavkirina poster û wêneyên taybet bi wan Şehîdan, yada Şehîdên jîngehê bilind nirxandin.




Di vê bîranînê de tekoşerên Demokrat, li cihên wekî: "girê Awyer, Parka Emîrye û derdorê Mizgefta Emîrye, û herwisa li cihên din ên wî bajarî de, wêne û poster belavkirin.

Şehîd "Şerîf Bacwer" û "Omîd Konepoşî", li dema agirberdanên bizanebûn a rejîmê di rojhilatê Kurdistanê de, û heya dema temirandina wî agirê, li roja 3`ê Xermanana 1397`an canê xwe gurî kirin, her bi vê sedemê roja 3`ê Xermanan, wekî roja Şehîdên jîngehê li Kurdistanê hat nasandin.

## Nerîna Lîderan



**Mike Pompeo:**

**“Rejîma Îranê mezintirîn piştîvanê terorîzmê ye di cîhanê de”.**



**Benjamin Netanyahu:**

**“Em di Îraqê de şerê Îranê dikin”.**



**Recep Tayyip Erdoğan:**

**“Divê em jî bibine xwediyê çeka Navkî”.**



**“Hesen Rûhanî”:**

**“Me biryara civînê digel Amerîkayê tineye”.**

# Ew malên me wêran dikin, em jî dengên xwe didin wan



**N: Eskender Ce`iferî**



Parlamenterên Ormiyê, hem ên Kurd û hem jî ên Azerî, her ew kes in ku li Meclîsa Îslamî a Îranê li ser wêrankirina malên kesên ku bi zêderûyî ew mal çê kirine. Bêy ku ti çaresereke ji pirsgirêkê re bînin.

Hilbijartin nêzîk dibin û belkî hinek ji wan kesên ku têne xapandin, careke din dengên xwe bidin wan.

Ji xeynî wan, wêrankirina malên Kurdan, stratejiya bingehîn a rejîmê ye û reformîst û tondgir, hemû li hemberî Kurdî wek hev in.

Hesen Rûhanî çar salan li ser kursiya desthilatê bû. Tevî ku slogana wî reform bû, lê nekarî tiştekê biguhere. Ew jî li ser siyasetên dewletên berê dimeşe. Ji ber ku qet nikare yasaya bingehîn a Komara Îslamî û siyasetên giştî biguhere.

Çar salên wî ên nû jî destpê kirin û pêleke din a givaşê li ser welatiyên Kurd di rê de hat. Ne tenê girtîgeh ciyê Kurdan e belkî mal û milkên wan jî rastî zewtkirinê tên. Hem mal û milkê girtiyên Kurd û hem jî malên wan welatiyên Kurd ku ji ber hejariyê bi zêderûyî hatine çêkirin, yan têne wêrankirin û yan jî têne zewtkirin.

Piştî destpêkirina duyemîn çarsalên Rûhanî, mala yekemîn welatiyê Kurd li Ormiyê hate wêrankirin. Islamabada Ormiyê ku zêdetir bûye cihê hejar û kêmdahatan, qet nabe xwediyê bûdceyek taybet ji bo avedankirinê. Welat rengê bajar bi taxên xwe ve nabînin lê li wir ne encumena gundan, belkî şaredarî heye. Ji ber kêmdahatbûn û hejariyê, welatî bi neçarî, malên xwe bêy standina derfeta avakirinê ji şaredariya Ormiyê yan jî ji saziya Avakirina Malan û Endazyariya Malan, çê dikin.

Di rojên destpêka duyemîn gerra serokkomariyê Rûhanî de hêzên şaredariya Ormiyê bi skorta hêzên polîs, mala karkerekî Kurd li Islamabada Ormiyê wêran kirin. Heman çarenivîs, li benda welatiyên din ên kêmdahat e eger dengên xwe bidin berbijêrên rejîmê ji bo parlamentoyê. Êdî divê ew dengê xwe ê nerazîtiyê hildin û hilbijartinê jî tam baykot bikin. Ji ber ku ew berendam, eger Kurd be yan jî Azerî be, tenê di xizmeta rejîmê de ye.

Bi vî karê dewleta Rûhanî, ne dengê reformxwazên Kurd derket ku behsa azadiyê dikirin û ne jî kesek derket xwepêşandanê. Parlamenterên Kurd jî weke hemû kiryarên gemar ên rejîmê xwe bêdeng kirin. Sedema ku xwepêşandan nehatin kirin jî ew bû ku her kes dizane eger di meşên girseyî de bê girtin, yan wê bi tometa şerê li dijî Xwedê rastî darvekirinê bê yan jî bi tometa hewldan li dijî ewlehiya netewî, wê bi girtineke demdirêj bê cezakirin. Ji dema destbikarbûna Hesen Rûhanî wek serokkomarê Îranê, rêjeya darvekirinê li Îranê û Kurdistana Rojhilat zêde bûye.
Ji wê demê ve heta niha bi sedan welatiyên Kurd hatine darvekirin û bi dehan kesên din jî bi darvekirinê hatine cezakirin.
Ew zarokê ku ji ber sermaya sibehên Ormiyê xewa şirîn nabîne, nizane ku Komara Îslamî jî Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan îmze kiriye ku li gor wê Danezanê, Jiyan, azadî û ewlehiya kesanî, mafê her mirovî ye. Li gora benda sêzde a wê dazanê, Mafê her kesî heye ku di nav axa dewletekê de bi serbestî rêwîtiyê bike û devera ku lê bicî bibe, ji xwe re hilbijêre. Mefê her kesî heye ku ji welatekî, yê wî jî tê de, derkeve û carekî din vegere wî welatî. Lê ew kesê ku dewleta Rûhanî mala wî xira kir, ne çûbû welatekî din û ne jî mêvan bû. Karkerek bû ku li ser axa bav û kalan ji xwe re xaniyekî biçûk ava kiribû û bi kar û xebata rojê, nanê şevê dikirî ş debara jiyanê dikir.

Yasaya xirakirina malên ku bi rengekî neyasayî û bi zêderûyî hatine çêkirin, bêy ku guh bide rewşa aborî a xwediyê malê, tê bicîkirin. Li gor xala sedem a yasaya şaredariyan li Îranê, ew xaniyên ku bi zêderûyî li ser erdên giştî hatine çêkirin, têne wêrankirin. Lê wê yasayê qet behsa wan kesan nekiriye ku bi pereyên xwe, erd ji saziya Ewqafê kirîne û niha jî, ji ber ku erdên wan di pilana berfirehkirina riyan de ne, têne xirakirin. Ew welatî qet nayên qerebûkirin. Akinciyên piraniya wan navçeyan jî, hejar in. Tevî ku ti sermayeyeke wan jî tine ye, nizanin derbasiya jiyanê li kuderê bikin.

# Bi lêdanê jî Kurd nebûn Tirk



N: Bûbê Eser



Gardiyan:
"Xwarin û vexwarina girtiyan li gor pêwîstiya wan bi zanetî ne dihat dayîn. Xwarina ku ji teref karmendê girtîgehê de ji bona girtiyan dihat dayîn, çemçikek şorbe bi çar kesan bû. Ava ku me dida wan qasî ku rojê qedehek para kesekî bikeve, dihat dayîn.

Nayê bîra min ku tu carî girtî bûne xwedî du qedeh av (Ji bilî hin îcatan). Tenê rewşa kesên xwefiroş û muxbîran cuda bû. Ji bona pêwîstiya girtiyan li kantînê çay jî dihate firotin.

Eger yuzbaşî bixwesta tenê ji firotina çayê, wî dikarîbû pereyekî zêde qezenc bikira. Lê ji bona ku girtî her dem, di hasreta çayê de bin, wî ev yeka jî nedikir. Lewra wî digot: "Divê her dem çavê girtiyan tî û birçî bin ku em bikaribin, hina ji wan bikin zilamên xwe.

Me baş dizanî bû ku vexwarina qedehek çay ji bona girtiyan gelek tişt bû. Ji ber vê bû ku berî dayîna çayê, me lêdanek baş li wan dikir, dema em diçûn ber deriyê qawişan me gazî wan dikir û digot:

-Qawiş!

-Emir bike komûtanê me.

-Ma hûn çay dixwazin?

-Eger tu emir bike belê, komûtanê me.

-Ma hûn dizanin ku berî vexwarina çayê wê çi bê serê we?

-Belê qomûtanê me, emir emirê te ye.

-Baş e, bîdonê çayê li gel du kesan derxin derve.

Li girtîgehê tiştên cam, hesin û metalên hişk hatibûn qedexekirin. Me çay ji wan re di bîdonên naylon de dianî û wan jî bi qedehê naylon ew çay vedixwarin. Ma em weha bê hiş bûn ku em qedehên cam bidin wan û ew tamekê ji çayê bibînin. Bi qedehên cam çaya germ vexwarin, ne li gor nîzama wê girtîgehê bû. Ji bona ku em lêdana tevayî bikin, ji heftê carakê, carna jî ji 15 rojan carekê, me çay ji wan re dibir. De îcar binere bê me çay bi çi awayî dida wan.

Carekê ew du kesên li gel bîdonê derdiketin, ji herkesî bêtir lêdan dixwarin. Di hanîna bîdonê çaya germ têde carna destê wan jê dişewitî. Lewra jî pêwîst bû ku wan bîdon ji kantînê heya qawişê bê bîhnvedan û dest guherandin hilgirtana. Ya na, çay bi devê wan nedibû.

Ji xwe ew êdî fêrî vê yekê jî bû bûn. Her carê di anîna çayê de destên kesên derdiketin, dişewitî. Lê her dem jî du kesan fedekarî dikirin, bêyî ku dilopek çay birjînin erdê an destê xwe biguherin ew çaya germ digîhandin hetanî ber deriyê qawişê. Eger dilopek çay jî bihata rijandin, wê rojê qawiş bê çay dima. Loma wan kesên radihişt bîdonê germ, him agahdariya wan ji bîdonê hebûn ku çay nerije û him bi awayekî nîzamî li gel xwendina sirûda dimeşiyan heta ber deriyê qawişê. Ji bona çi ez dibêm ber deriyê qawişê? Biner bê çima?

Wan bîdonê çayê datanîn ber derî, lêdana xwe dixwarin û diketin hundur. Ew çay hîn germ bû. Ma dibû ku em çaya germ bidin dujminê miletê xwe? Na, na nedibû, ji ber vê yekî me gazî dikir:

-Qawiş!

-Emir bike komûtanê me.

-Têkevin rêza lêdana bi tevayî.

Girtî fêrî vê yekê jî bûbûn. Loma hemûyan li hundir xwe li ber derî dixistin rêzê, wan kesên berê lêdan bixwarana çaya germ jî bi xêra wê lêdanê vedixwarin. De binêre bê me ew xistibûn çi rewşê ku ji bona vexwarina qedeheke çaya germ, herkesî dixwest ku berê ew lêdanê bixwe. Me jî bi vê yekê dizanîbûn.

Vexwarina çayê jî bi vî awayî bû. De were ji bona qedeheke çay him destê xwe bişewitîne û him jî lêdana xwe ya qenc bixwe. Bi ser vî halî de eger me ji wan re her roj çay bianiya jî, wan nedigot na.

Bi rastî carna em bi xwe jî li halê wan ecebmayî diman. Roj bi roj, saet bi saet tade û îşkencên me dianî serê wan zêde dibûn. Her rojekê babet û şiklê lêdanê dihate dîtin, her saet jî şiklekî nû dihate ceribandin. Êdî her lêdan û îşkencên me, bê berxwedan dihatin qebûlkirin û pêkanîn.

Tu kes êdî li dij kiryarên me ranedibûn. Kesên ku ev tişt qebûl nedikirin, ew ji xwe di hucran de dibûn. Halên kesên weha xerabtirîn hal bû. Ew kesên di hucran de û serî ji kiryar û biryarên me re nedanî, me yeko yek di hucran da, bi darê zorê, bi wan dida qebûlkirin. Wextê me jî zêde digirt, lê dîsa ji %95ê girtiyan daxwazê me pêk dianîn.

Yuzbaşiyê me, ji me re digot: "Kurên min we firset bi dest xistiye, hûn çi dikin bikin. Pêwîst e ku hûn van girtiyan bikin welatperwerên tirk. Divê hûn wan bikin tirkên baş, damarên wan î qels bigirin ku êdî ew bibin mirovên baş û hevalên xwe yên derve bidin dest".

Lê tu carî ev merama yuzbaşiyê me pêk nehat. Ne ew bûn tirk û welatperwerên tirkan û ne jî tucarî serîhildan û berxwedan ji wê girtîgehê rabû. Her ku ew fêrî lêdanekê an jî şiklekî îşkencê dibûn, me îcateke nû di serê wan de diceriband.

## Çil sal bi ser komkujiya li parêzgeha Urmiyê re derbaz dibe

**Îro 11`ê Xermanan, Çil sal bi ser komkujiya xelkê çendîn gundên parêzgeha Urmiyê re derbaz dibe.**

Îro Çil sal bi ser komkûjiya xelkê çendîn gundên parêzgeha Urmiyê re derbas dibe, li rêkevta 11`ê Xermanan 1358 (2`ê Îlona 1979`an) rejîma kevneperest a Îranê êrîşê ser çend gundên nêzîk bajarê Neqedê ên bi navên "Qarnê û Qelatan" kir û, di wê êrîşa dirindane de dehan welatiyên kurd bi awayekî dirindane hatin kuştin.

Rejîma bi nav Îslamî bi awayekî dirindane êrîş kire ser wan gundan û 68 welatî bûne qurbanî.



Ew komkujiya di demekê de rû da ku, hêşta wajoya fitwaya Xumêynî hişik nebibû, carek din destkirin bi kuştina welatiyên Kurd, armanc ji wan êrîşan bi çok de anîna Îrada neteweyekê bû ku dixwest bi nasnama xwe bijî, lê bi sedan komkujiyên wiha nekarîn lê nekarîn netewa Kurd bi çok de bîn in.

## Loristan, piştî derbasbûna 5 mehan di ser hatina lehiyê de her wekî xwe ye

**Piştî 156 roj ji ser hatina lehî a parêzgeha Luristanê re derbas dibe, zirar berketiyên lehiyê rojên tal derbas dikin û nigeranê hatina baraneke dinin.**

Piştî derbasbûna 5 meh li ser hatina lehiyê li parêzgehgê Luristanê, rejîma Îranê hêşta tu pêngavek bo avakirina avahiyên zirarberketiyên lehiyê neavêtiy e.

Di bajarê Polduxter a parêzgeha Luristanê de, ku xelkê wî bajarî bi giştî rastî ziraran hatin, bi awayekî ku di dema rabûna lehiyê de, gelek avahî di bin lehiyê de bat bibûn, lê heya niha nav bajar her wekî xwe ye û berpirsên rejîmê jî ti hewlekê bo avedaniya bajar nakin.

Ji aliyek din ve ku karê piraniya xelkên wî deverê, çandiye, û wan di rabûna lehiya îsal de, hemû berhemên çandiyên xwe ji dest dan, lê piştî derbasbûna 5 meh di ser wê bûyerê de, heya niha zirarên wan ji aliyê rejîmê ve nehatine qerebûkirin.



Serokê "Bonyadê Mesken" (Binyata Avahiyan) ê rejîmê, di serdana xwe a çend roj berî niha di parêzgeha Luristanê de, soz ji welatiyan re dabû ku, "dê Luristanê li berê, xweştir û avadantir bik e".

Disan wekî hertimî berpirsên rejîmê, soz û qewlên direw didin û ti xizmetgizariyekê jî, bo xelkên belengaz ên zirarberketî cîbicî nakin.

## Du welatiyên kurd bi salek û şeş meh girtîgehê hatine cezadan

**Du welatiyên Kurd ên xelkê bajar Mako û Bokan, li dadgehên şoreş a wan bajaran de, be salek û şeş meh hatine cezadan.**

Pêka nûçeya ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, di heyama rojên derbasbûyî de, ciwanekî Kurd ê bi navê "Hemîd Bilixkanlo", xelkê bajarê Makoyê, ji aliyê dadgeha şoreş a bajarê Urmiyê ve, bi tohmeta "alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îranê" bi salek hepis hate cezadan.

Ew welatiyê Kurd, roja Sêşemî 28`ê Cozerdana îsal, li nêzî zanîngeha azad a bajarê Urmiyê, ji aliyê hêzên îtila`atê ve hate desteserkirin û bo cihekî nexûya veguhastin.

Ew welatiyê Kurd di sala 1396`an de, bi tohmeta "çalakiyê siyasî û alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îranê" li domkirina xwindinê li zanîngeha Peyamnûr, bê par kiribûn.

Her di vê pêwendiyê de, roja 10`ê Xermanan, welatiyekî Kurd ê bi navê "Ce`ifer Pekend", temen 50 salî û kurê "Mihemed Salih" û xelkê bajarê Bokanê, bi tohmeta "alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îranê" li dadgeha şoreş a wî bajarî, bi şeş meh hepisa te`izîrî hate cezadan.

Ceifer Pekend" roja Çarşemî 19`ê Pûşperê, bi tohmeta "alîkarîkiirn digel yek ji Partiyên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îranê" hatibû desteserkirin û bo girtîgeha îdareya îtila`at a bajrê Urmiyê hatibû veguhastin.

"Ceifer Pekend" roja 15`ê Gelawêjê, piştî dawîhatin li lêkolînê, bi danîna barimteyê bi awayekî demkî hatibû azadkirin.





## Çardehemîn fistîvala şano a ser şeqam di bajarê Merîwanê de dawî pê hat

**Çardehemîn fistîvala navdewletî a şanoya ser şeqam li bajarê Merîwanê, piştî derbasbûna 5 rojan û bi amadebûna 11 welatên cîhanî, li bajarê Merîwan a Rojhilatê Kurdistanê, dawî bi karên xwe anîn.**

Fistîvala şano a ser şeqam di bajarê Merîwan de ku li roja 1`ê Xermanan destpêkir, û roja Sêşemî 5`ê Xermanan bi destnîşankirina serkevtî a fistîvalê, di rêûresmeke taybet de dawî pê hat. Rêûresma dawîhatina wî fistîvalê, di salona “Nişat’ a ser bi bajarê Merîwanê de hate lidarxistin.

Çardehemîn fistîvala şano a ser şeqamên bajarê Merîwanê, bigiştî 86



pêşandan li 28 girûpên navxweyî ên Îran û 10 girûpên derveyê Îranê jixwe girtibû.

Yekemîn roja fistîvalê bi pêşandana girûpeke Îtaliyayî li parka “Şano” a bajarê Sine detpêkir. Di roja duhem de, 15 pêşandan, roja 3`emin 31 pêşandan û di roja dawî de, 7 berhem li bajarê Merîwan bo amadebûyên fistîvalê pêşandan.

## Cododakerekî Xurasanî xatirê xwe ji werzişê xwast

**Mihemed Birîlanlû xwedê midala bironiz a cîhanî, bi sedema pêşî lêgirtin li kêbirkêya cîhanî xatirê xwe ji dinyayay werzişê xwast.**

Malpera “Codo Însayit” sedema jêbirkirina wî qehrimanê Kurd ê Xurasanê hev girûp digel rikaberê Îsra`îlê daye zanîn û nivîsiye: “Demeke gelek xemgîn bo werzişê”. Eve di demekê de ye ku, fidrasiyona cîhanî a Codoyê daxwaz ji Îranê kiribû ku dibe digel rikaberê xwe kêbirkê bikin.

Fidrasiyona Codo a Îranê bi awayekî eşkere daye zanîn ku, sedema amadenebûna Codokarê me, eve ye ku “Mihemed Birîlanlû” bixwe amade nebûye, lê wî werzişvanê Kurd ê xelkê Xurasanê di ser rûpela xwe a Înistagramê,



ew idî aya Fedrasiyonê ret kiriye.

“Mihemed Birîlanlû” xelkê bajarê Bîcnord a navenda parêzgeha Xurasana bakûrî ye. Navbirî xwedê çendîn midalê Codoyê di asta navneteweyî de ye.

Her di vê pêwendiyê de, du sal berî niha “Cewad Mehbûb” ê kurdê Xurasanê ku, di kêbirkêya Codoyê, di asta cîhanî de jî, kesekî binavbang bû, û bi sedema piştevanînekirin ji navbirî re xatrê xwe ji dinyaya werzişê xwast.

## Nivîser û lêkolerekî navdar ê kurd koça dawiyê kir

**Nivîser û lêkolerekî navdar ê Kurd ê xelkê Rojhilatê Kurdistanê koça dawiyê kir.**

Roja Şemî 9`ê Xermanan, Mamosta “Mela Ehmed Nezerî” nivêser û lêkoler ê Kurd, bi sedema nexweşiya dil, di temenê 73 saliyê de çû ber dilovaniya xwe.

Navbirî ji aliyê Mamosta “Qani`i” ve, bo nivîsînê hatiye handan û çendîn berhem pêşkeşî pirtûkxaneya Kurdî kiriye.

Berhemên “Mela Ehmed” wiha ne: Zayeleyî Zirêbar, komkirina dîwana Mela Hesen Dizlî, Pirtûka Gencîney peyva Kurdî, komkirin û amadekirina dîwana Ferîqî, gotinên xweş ên Kurdî, û gulbijêrek ji rişteya Mirwarî”.

Mamsta “Mela Ehmed Ne-



zîrî” Kesayetiyekî xweşnav ê deverê bû, ji bilî nivîsîn û mamostayetiya mizgevtan, di xwendingehên Merîwan û Sine de jî, erkê wane gotinê ji stuyê wî bû.

“Mela Ehmed” sala 1325 a rojî li gundê “Degaga” a ser bi bajarê Sewlawa ji dayik bû, û heya dawiya jiyana xwe, ji xizmet çand û netewa xwe de bû.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê Sersaxiyê ji malbat, xizm û kesûkarên wî zana û civata zanayên olî re dibêje û xwe bi hevparê xema wan dizane.

## Rejîma Îranê, asarên dîrokî ji nav dibe

**Rejîma Îslamî a Îranê, dest di nav talankirina şûnvarên dîrokî de heye, û vê carê jî, li bajarê Seqizê destavêtiye têkdana şûnvarên dîrokî û mijûlê jinavbirina cihên dîrokî ên Kurdistanê ye.**

Pêka nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê, parek li kela dîrokî a gundê “Masyera Şêx”, ku helketiye di navbera gundê “Masiyera Şêx û Mosim ava”, ku hemberî gundê “Masiyer Slêman” a girêdayî devera Xurxure ya bajarê Seqizê, ji aliyê rejîmê ve hatiye têk dan.

Ew kela dîrokî, çend sale ji aliyê îdareya Mîrata Çandî û Spaha Pasdaran a terorîst ve dest bi ser de hatiye girtin, û bi xelkê wê deverê re gotine ku, dezgehek hişyarî tê de danîn e û nabe ti kes lê nêzîk bib e.

Rejîma Îranê, di wî heyamê de, bi hênceta kêşana boriya gazê, parek li dîvarê kelê hiloşandiye, û zirareke mezin gihandine wê kelê û xelk jî, kevirên wê bi xwe re birin e.

Ew kele bi sedema kevin bûn û keş û heva, pareke zêde bi ax û tuz hatiye veşartin. Rejîm jî ne îzinê dide xelkê serdanê bikin û ne jî, bi xwe nû dike û heta îzin bi ti Saziyekê jî nade ku tê de kar bik e.



Rejîma Îslamî a Îranê dest di nav talankirin û dizîkirina asarên dîrokî ên Kurdisytanê de heye, ji bo vê nahêle xelk serdana wî cihê dîrokî bikin.

# Zimanê Kurdî

- Hespên me, wa li mêrgê ne . - Wa birûsk li başûr vedidin .

Têbînî : Çi tiştê ku derbarî alava (va) yê hatiye gotin, derbarî (wa) yê jî rast e ku bê gotin, ji bilî : - (va) bo destnîşankirina navên nêz e . - (wa) bo destnîşankirina navên dûr e .

4- Cînavên Bêhêl (bêlayen)

Cînavên bêhêl ew cînav in, yên ku li şûna gelek hêlên nav û cînavên kes, canewer û tiştan bikar tên . Anku,ne weku cînavên dîtir şûna hêleke nav û cînavan tenê digrin . Cînavên bêhêl di zimanê kurdî (KJ) de ev in : (ê, xwe, hev, hevûdû, êk, êkûdû) . Ev cînavên bêhêl, li gora wate û bikaranîna wan,dibin (3) beş :

A - Cînavê pevxistî, (ê) .
B - Cînavê xweyî, (xwe) .
C - Cînavên hevayî, (hev, hevûdû, êk,êkûdû).

Her beşek ji van beşan, di pertûkên rêzimanî de, bi navekî xweser hatiye danasîn . Lê ji ber ku ev her sê beş jî cihê gelek hêlên nav û cînavan digrin, me ew tev bi vê navlêkirina gelemper (cînavên bêhêl), dane nasîn. Lê digel vî navê tevayî jî, me her beşek ji wan, li gora taybetmendiya wî, navek dayê û di bin wî navî de me ew ravekiriye .

A- Cînavê pevxistî (Ê) :

Ev cînavê bêhêl di pertûkên rêzimana kurdî (KJ) de, bi gelek navan hatiye nasîn . Her rêzimanzanekî ev cînav-li gora dîtina xwe-navek lê kiriye .
Wek :

- Celadet Bedirxan : “Pronavê Lihevxistî”. (Bingehên Geramêra Kurdmancî- Stokholm- 1994).
- Reşîd Kurd : “Bernavê Bêhêl”-(Rêzimana Zimanê Kurmancî- Şam – 1956) .
- Kamîran Bedirxan û S.Şivan : “Pronavê Kurtkirî”- (Zimanê Kurdî- Îstanbol – 1976) .
- Feqe Huseyn Sagniç : Ev cînav kiriye (2) beş
- “Cînavka kevnî lêkerî”
- “Cînavka kevnî daçekî”-(Rêzimanê Kurdî – Îstanbol – 1991).
- Sadiq Behadînê Amîdî : “Cînavê Bêhêz” – (Rêzimana Kurdî- Bexda- 1987).

Bi egera ku ev cînav şûna gelek hêlên cînavan (nîşandan,kesîn) digre, me jî ( wek Reşîdê Kurd) ev cînav bi navê “cînavê bêhêl” xebitandiye . Bi dîtina min, ev navlêkirina ha li gora têgeh û bikaranîna vî cînavê pevxistî ye .

Di pêvajoya hevokan de ev cînavê bêhêl, bi (2) şêweyan bikar tê : 1- Bi karan (kirinan) re . 2- Bi pêrbestan (daçekan) re .

1- Bi karan re : Ev cînanavê nîşandan (vî, vê,

wî, wê) ku li pey hindek karan bikar bên, bi kurtebirrî dibin (ê) û bi karan ve têne nivîsîn .
Wek :

- Te pênûsek da vî (xwendekarî) ?
( Erê, min pênûsek da vî...) ( Erê, min pênûsek dayê ) - Te pênûsek da vê (xwendekarê) ? ( Erê, min pênûsek da vê...) ( Erê, min pênûsek dayê ) - Tu çûyî wî xaniyê ha ? ( Erê, ez çûm wî....) ( Erê, ez çûmê ) . - Avê bixe (bêxe) wê (perdaxê) !

( Min av xist wê )
( Min av xistê ) .

Wilo jî ev her dû cînavên kesîn (wî, wê) ku li pey hindek karan bêne xebitandin, ew jî bi kurtebirrî dibin (ê) û bi wan karan ve têne nivîsîn . Wek :

- Azad rojname da hevalê xwe
( Azad rojname da wî ) ( Azad rojname dayê ) . - Nêrgizê jî rojname da Zînê ( Nêrgizê jî rojname da wê ) ( Nêrgizê jî rojname dayê ) .

2- Bi pêrbestan re : Cînavên nîşandan (vî, vê, wî, wê) û yên kesîn (wî, wê) ku li pey van pêrbestan (ji, li, bi, di) bikar bên, ew cînav û pêrbest bi hev re têne kurtkirin û pevxistin û bi vî şêweyê jêrî têne xebitandin :

(jê, lê, pê, tê ) .
Wek : a- (pêrbest + cînavên nîşandan ) :

**Dom heye...**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (357)



# Şerefkendî, deryayek ji rastbêjî û emegnasiyê